

Źibo  girtiyên «bi zmanê kurdî» yên di bin zilma tirkên niźatperest u faśîst da,
źibo yên ku bedenên xwa roź bi roź di birćîbunê da dikin «ala zmanê kalikan» yê di komayê da.

## Deriyên Qiblegehên Kêr Kirî

Li ber deriyekî kêr kirî
Ez qiblegeha zmanê xwa vedidim
Bi pariyek nan, tisî
Bi tasek av, westiyayî.

Leza min nîn e
Leza min nemaye
Lezê b’ min negirtiye
Lez l’ min neketiye
Bê lez im
Lezrevok im
Lezśermok im
Lez-ne-hez im di qiblegeha peyvikên min ’ên wêran kirî da.

Ez ê źi beźna vê śevê kindtir
 Źi beźna vê roźê drêźtir
Sondeke nemir bixwînim bi ćekuyên źi zmanê min rakiśandî.

U vê gavê
Ne tirs
Ne xem
Ne źan
U ne źî hêś tê ra derbaz dibe, canê.

(12.11.2012, s00:45, Zürich – Swîsre)